

Nameya Roja Şanogeriye

Damezirandina Şanoya navneteweyî ITI

Saziya Cîhanî ya bikaranîna Huneran

Nameya roja cîhanî ya Şanogeriye 2020 ji amadekirina Shahid NEDEEM

27ê Avdara 2020ê

Rûnivîsa Kurdî ji ber ya resen (Înglîzî)

Shahid NEDEEM, Pakistan

Şanogerî weke Rûgeh

Nivîsandina nameya Roja Cîhanî ya Şanogeriye 2020 ji min re şanaziyeke gewre ye. Rast e, merov bi nizimbûnê dihise lê, di heman demê de jî, cihê kêfxweşiyê ye ku Pakistan û şanogeriya xwe, di nav şanoya cîhanî de, di vê dema me de, ji aliyê ITI ve weke şanogeriyeke nemînende, bi bandor û di asteke payebilind de, hatine pejirandin. Ev rûmet bi saya Madeeha Gauhar¹, damezirêner û alîgira Grûpa Ajoka² ya Şanogeriye, hem jî hevîna min e. Ew ji du salan ve miriye. Rêya grûpa Ajoka ku ji kolanan derbasî şanogehan bû rêyeke dijwar bû. Ez xweş pê bawer im ku ev çîroka gelek komên şanoyê ye. Ev qet ne pêvajoyeke hêsan e; lêbelê, ew her û her têkoşîn e.

Ez ji welatekî ku, bêhtirê hemwelatiyên wî misilman in, hatime. Welatekî ku di gelek setemkariyên leşkerî re derbas bûye, rastî pir êrîşên

¹ Madeeha Gauhar (1956 – 2018): Derhênerê şanoyan, leystikvan di beşê şanogeriye de bawernameya Master (Macistêr) di şanogeriye de, ji Zanîngeha Royal Holloway ya Londonê wergirtiye, û Xelata Rûmetdariyê ji desthilatdariya Pakistan û Mîr Claus Award yê Holanda wergirtiye.

² Şanogeha Ajoka: Di sala 1984ê de hatiye damezirandin. Peyva Ajoka di zimanê Bencabî de tê wateya "Hevdem". Pêdiviyên wê şanoyê derbarê babetên mîna lêborîna ayînî, aştî, tundiya zayendî, mafên merovan in.

dijwar û metirsîdar yê olî hatiye, û di sê cengan re, bi Hindistana hevsînor re derbas bûye, ew welatê ku dîrok û jêmaya bi hezarên salan me û wan bi hev ve girê didê. Îro roj jî, em hîn ji şerekî wêranker, nemaze yê navokî (niwewî), bi hevcêwiyên xwe yê hevsînor re ditirsîn; û herdu welat jî xwedî çekên navokî ne.

Carina em bi ken û henekî dibêjin "demên nebaş ji şanogeryê re delîvine baş in". Tu rewşên dijwar nîn in ku merov wan çareser bike, ne nakokî hene merov wan diyar bike, ne jî statûyeke dijwar heye merov wê têk bibe. Ji bêhtir ji 36 salan ve, ez û koma xwe ya şanogeryê Ajoka, li ser vî benê pêlewaniyê dilîzin. Bi rastî jî, ew benê pêlewaniyê ye: Ew terazûya di navbera şahî û perwerdekirinê de, di navbera lêgerîn û hînbûnê ji demên borî û amadekirina jibo siberojê de, di navbera afirandina derbirînên azad û metirsiya zêdegotinê di riya naveroka şanoyê re, di navbera şanoya civakî ya rexnedar û ya sûdexwaz a ku bête pêşkêşkirin de, di navbera xwegihandina ber bi gelêrî û çîna bijarte de diparêze. Merov dikare bibêje ku divê şanoker cadûger be, nêreng be.

Li Pakistan, dabeşbûneke xuya di navbera kesê pîrozdar û yê kirêtdar e pîs de heye. Tu cihên jibo olperestiyê ji kesê kirêtdar re tune ne. Di heman demê de, kesê pîroz ne guftûgoyên berferêh, ne jî ramanên nû dipejirîne. Bi rastî, li gor sazûmana parêzyar, çand û huner dijî "baweriyên wan yê pîroz" in. Lewre jî, cihên pêşkêşkirina şanoyan, li gorî baweriyên wan, mîna meydanên pêşbaziya berbestan in. Pêdivî ye ku, berî her tiştî, ew bawernameyên xwe bidin xuyakirin ku ew misilmanine qenc û hemwelatîne pêkhatî ne, û hewl bidin jibo çespendina baweriyên ku dîlan, mûzîk û şanogerî li gorî Misilmaniyê ne, qedexe ne. Hejmareke bilind ji misilmanên parêzyar bergiriyên pejirandina pêşbazî û bikaranîna huneran dikin; herwiha jî, dîlan, mûzîk û şanogerî di jiyana wan ya rojane de, qedexe ye. Wê hingê jî, di pêşkêşkirina jêrçandê ku karibe kesê pîrozdar û yê kirêtdar bîne ser heman şanogehê, em dilukumîn û rastî astengiyan dihatin.

Di qonaxa rajoriya leşkerî li Pakistanê, di salên 1980yan de, grûpek hunermendên ciwan dest bi birêvebirina Ajoka kirin. Di rêya şanoya rikberiyê civakî û siyasî re, wan dijberiyên desthilata zordar kir. Ew gihane wê baweriyê ku hestên wan, hêrsa wan û êşên wan bi dengbêjiya softî³ û

³ Softî: Kevneşopandina Xwedênasiyê di ola Misilmaniyê de ku, di hundirê ezmûnên rasterast yê kesane de, li rastiya hezkirina Xwedayî vedikole. Ev bawermendî bi şeweyekî gelêrî û berferêh belav bûbû, jiber wê biratiya giştî seranserî cîhanê doz dikir, û dijatiya

bi şeweyekê 'ecêb dihate vegotin. Ew softiya ku berî 300 salî hebû. Ev helbestvanê softiyê yî payebilind Bulleh Şah⁴ bû. Di pêvajoya rikberiya xwe dijî gendeliya desthilata siyasî û tundûtûjiya sazûmana ayînî, Ajoka tê giha ku ewê karibe gotinên siyasî û dijwar ji helbestên wî bîne ziman. Desthilatdar dikarin rê li ber me bigirin û qedexe bikin, lê nikarin helbestvanekî olî yî gelêrî û payebilind mîna Bulleh Şah qedexe bikin. Em tê gihan ku jiyana wî, weke helbestên wî, guhêrbar û bingeîn e. Ev şeweyiyana wî bûye sedema ku pir caran hatibû sergûnkirin. Wê hîngê, min şanoya "Bulha" li ser têkoşîn û jiyana Bulleh Şah nivîsî. Bulha, weku di nav piraniya gelên Başûrî Asiya de, bi dilxweşî dihate destnîşankirin, yek ji kevneşopînerên helbesta ayînî ya Bencabê bû. Wan di nava helbestên xwe, ezmûn û serpehatiyên xwe de, bêtirs rikberiya desthilatdariya şahînsahan û oldarên xapînoker dikirin. Wan bi zimanê gel li ser hêviyên girsekomên civakê nivîsandin. Wan dît ku mûzîk û dîlan, bi rêya eşkerekirina dilgiraniyê derbarê navbêjên olî, alavên naskirina girêdana rasterast di navbera merov û Xwedê de ne. Wan berevaniya zayend û beşên çînen civakê dikirin û matmayî li stêrê dinêrîn weke nîşanek ji hêzbûna Xwedê be. Encûmena Huneran ya Lahorê, deqê nivîsandî nepejirandin çinku, li gor wan, ew ne şano ye, lê ew ne bêhtir ji jîyan-nameyekê ye. Lêbelê, dema ku şano li cihê şûngir ji cihê çêbûna bûyeran re (Amojgeha Qotî) hate pêşkêşkirin, bînerên beşdar ew hêma naskirin, tê gihan û ew weke destnîşana jiyana û helbestên helbestvanê gel pejirandin. Beşdaran karîbûn jiyana û hemî demên wî bi giştî nas bikin, û dîtin ku ew weke jiyana û hemî çaxên wan in.

Di wê demê de, di sala 2001ê de, cureyekî şanogeriya nû peyda bû. Mûzîka Qewalî ya Ayînî⁵, vegotina helbestên peyxameyî (îlham) û şahiya Sûfî Dhamal⁶, û stranên Zikir⁷ yên ramanî jî bûne beşin ji şanoyê. Grûpeke ji

prensîbên ayînî yên tund dikir. Helbesta ayînî, bêhtir bi mûzîkê tête pêşkêşkirin, têgeha yekîtiya Sûfî di rîya nîşankirinên hezkirina kirêt re.

⁴ Bulleh Şah (1680 – 1757): Helbestvanekî Bencabê xwedî bandor bû ku, bawerî bi Sûftiyê tanî. Wî bi zimanekî hêsan li ser mijarên tevlihev yên felsefî nivîsiye. Wî bi awakî tund rêgeha Ortodoksî û desthilatdariya çîna bijardeyan rexne dikir. Ew bi zendîqbûnê hatibû tawanbarkirin, loma jî ew ji bajarê Kasurê hatibû derxistin. Herwiha jî piştî ku mir, binaxkirina wî li goristana bajêr qedexe kirin. Ew di nav stranbêjên gelêrî û ayînî de naskirî bû; û di dema dabeşbûna olî de jî, ew cihê dilxweşiyê bû.

⁵ Qewalî: Helbestên Sûfî yên Olî ku grûpeke stranbêjan (Qawwal) distrandin; ev cureyê stranên carê li goristanên Ayînî ku rêya ber bi dewleteke xweş ve pêş guhdaran dikirin.

⁶ Dhamal: Dîlana bi dilşadî li ser goristanên Sûfîyan, bêhtir li ber dengê daholê ye.

⁷ Zikir: Stranên kêşdar yên Olî, vegotina nimêjan, pêkanina rewşenbîriya giyankîtiyê.

Sîxan (Sikhs)⁸ - li bajêr bûn jibo di konfiransekî Bencabî de beşdar bibin; û derbas bûn da ku şanoyê bibînin – di dawiyê de derketin ser cihê şanogehê, leyîstikvanên şanoyê hembêz kirin û maçkirin û qîr dan. Piştî parçabûna Hindistanê, di sala 1974ê⁹ de, ew cara yekemîn bû ku bi Bencabiyên Misilman re derdikevine ser şanogehê. Weke encam ji vê bûyerê re, civaka Bencabî hate dabeşkirin. Nêzîkbûna Bulleh Şah ji wan ve weke nêzîkbûna wî ji Bencabiyên Misilman bi xwe bû jiber Sûfî ji dabeşbûna olî û ya civakî derbas bûbûn.

Di pey vê pêşkêşkirina yekem e payebilind re, rûnivîsa Hindî ji Odîsa (Odyssey) ya Bulleh Şah hate pêşkêşkirin. Piştî ezmûna geştiyarî ye xweş li parçeyê Hindî ji Bencab, û di diwartirîn tengijandina di navbera herdu welatan de, digel ku li deverên ku bîner peyveke tenê jî bi zimanê Bencabî nizanîbûn, lê wan ji her kêlîkekê ji şanoyê hezdikirin; herwiha jî, "Bulha" li seranserî Hindistanê hate pêşkêşkirin. Di dema ku derî hemû li pêşiya danûstandinên siyasî û diplomasiyê dihatin girtin, deriyên şanogehan û dilê hemî Hindiyan ji wan re bi temamî vekirî bûn. Di pêvajoya gera Ajoka li Bencaba Hindî di sala 2004ê de, ku hezarên gundiyan bi dilxweşî li şanoyê temaşa dikirin, kalemêrek û xortek pê re, ber bi şanogerekî şanoyê ku bi rola kesayetiyeke gewre ji Sûfiyan hatin. Kalemêr jê re got: "Neviyê min nexweş e, hêvî dikim tu hilma xwe ye pîroz bi ser wî de berde". Leyîstikvan ber bi paş ve vegeheriya û got: "Babaji¹⁰, ez ne Bulleh Şah im! Ez tenê şanogerekî şanoyê me û bi vê rolê radibim." Kalemêr dest bi girî kir û got: "Hêvî dikim tu neviyê min pîroz bikî; ez xweş dizanim eger tu wî pîroz bikî, ew dê riha bibe." Me ji şanoger xwest ku daxwaza kalemêr bicih bike; wê hîngê, şanoger hilma xwe bi ser xort de berda. Wê hîngê, kalemêr jî dilxweş bû û berî ku biçê, kalemêr ev peyv gotin: "Kurê min, tu ne şanoger î, giyanê Bulleh Şah di laşê te de ye, tu Xwedawend (Avatar) î."¹¹ Ramana şanogeriye û têgeha leyîstikvanê şanoger ji nişka ve li me derket, çûnkî şanoger dibe laşbûyîneke nû ji giyanê kesayetiya ku wê dinimîne.

Di her 18 salên geştiyariyê bi "Bulha" re, em pêrgî heman bersivmendiye ji aliyê beşdaran ve hatin ku berê wiha nebûye; ew beşdarên ku li gor wan, şanogerî ne tenê vehisîn e, yan têvedeke

⁸ Sîxan (Sikhs): Peyrewên bawermendiya Sîx (Sikh). Ev bawerî di sedsala 15ê de, ji aliyê Guru Nanak ve, di nav Bencabiyên de cih girt.

⁹ Welatê Pakistan yê Misilman, di sala 1974ê de, ji Hindistanê cuda bû piştî Kuştareke giştî ku berê çênebûbû di nav civakê û hemwelatîyên koçberbûyî de.

¹⁰ Peyveke rêzgirtinê ku ji kesên temenmezin re tê gotin.

¹¹ Avatar: Li gor çanda Hindî ye ku tê wateya laşbûyîn yan dubarexuyakirina giyanê kesayetiyeke pîroz di laşê peyrewêkî sax de.

hişyarkirina ronakbîrî ye, lê pêrgîneke çalakirina giyanê ayînî ye jî. Bi rastî, şanogerê ku bi rola kesayetiya mamosteyê Sûfî (olî) Bulleh Şah radibû pir ketibû bin bandora rastiya ku ew bi xwe bûbû helbestvanekî Sûfî, û du dîwanên helbestan weşandibûn. Şanogerên ku bi berhemê ve têkildar bûn, gotin ku dema bikaranîna şanoyê dest pê kir, ew pê hestiyar bûn ku giyanê Bulleh Şah di nav wan de ye, û şanogeh dibû mîna erdeke rasterû ye berz. Zanayekî Hindî, di nav gotareke derbarê vê şanoyê, navnîşana wê "dema şanogeh dibe cihekî pîroz" nivîsîbû.

Ez ne kesekî ayînî me û guhdana min li Sûfîzmê (ramanên ayînî) tenê di aliyê rewşenbîrî de ye. Ez bêhtir bi aliyên hunermendî û şanogerî yê helbestvanên Sûfî yê Bencabî ve girêdayî me. Lê, cemawerên li min temaşa dikin, dibe ne hişkbawer û tundrew in, lê dibe ku xwedî baweriyên olî jidil bin. Vedîtina çîrokên weke ya Bulleh Şah, û gelekên din yê mîna wê di hemî çandan de, dikare bibe pireke ku me – têkildarên şanoyê - û bînerên ku nezan in, lê dilgerm in, bi hev ve girê dide. Em bi hev re dikarin aliyên şanogeriya yê giyanî û rûhî bidin xuyakirin, û piran di navbera demên borî û yê bînan de ava bikin jibo avakirina siberojeke ku çarenivîsa hemî gelan be, çi kesên bawermend û çi nebawermend, şanoger, kalemêr û neviyên wan.

Sedemê ku min hevkarî di çîroka Bulleh Şah de kir, û peydakirina me ji vî cureyê şanogeriya Sûfî re ew bû ku, dema me li ser şanogehê pêşkêş dikir, carinan felsefe û têgehên me derbarê şanogeriya em dûr dixistin, rola me weke rêberên daxwazkirina guhertina civakê û tiştên wisa, sedem bûn ku me beşekî mezin ji gel li pey xwe dihêlan. Di pêvajoya beşdariya me jibo çareserkirina pirsgirêkên gengaz di siberojê de, me xwe ji pêdeçûna dijwar di ezmûna giyanî de, ya ku dibe encama şanogeriya, diparast. Di vê cîhana îroyîn de ku tundrewî, nefret û dijwarî careke dî xurt bûne, hin netewe hinên din bindest û tune dikin, bawermendin dijî hinên din şer dikin û civakin kîne ji civakine din re dikişînin... û di heman demê de, zarok jiber bedxwerî û kêmxwarinî, û jiber kêmhêbûn guhdana tinduristî di dema guncaw de, û geşbûna ramanweriya kîne, dayîk jî di dema zarokdayînê de dimirin. Rojgera ku em li ser dijî bêtir û xurtir ber bi bobelateke keş û seqayê ve diçe, û merov dikare dengê simên hespên (Four Horsemen of the Apocalypse)yê bibihîze¹². Pêdivî pê heye ku em dîsa hêza xwe ya giyanî xurt bikin; pêdivî ye ku em dijî xesarî, westan,

¹² Four Horsemen of the Apocalypse yê ku Yûhena yê Patmosê di pirtûka xwe ya Peyama Diyarkirinê – pirtûka dawî ji Peymana Nû - de li ser wan nivîsiye. Di piraniya hejmarên hatine gotin de, herçar siwar nîşana Serkeftinê, Cengê, Birçîtî û Mirinê wiha rêzkirî ne.

bêhêvîbûn, çavbirçîtî û paşguhkirina vê cîhana ku em tê de dijîn, vê rojgera ku em li ser dijîn şer bikin. Şanogerî xwedî rol e, xwedî roleke payebilind e di çalakirin û livandina merovahiyê de, da ku xwe ji jêrketina ber bi kortalê ve dûr bixe. Ew dikare şanogehê, cihê pêkanîna şanoyê ber bi pîrozbahiyê ve bilind bike. Li Başûrê Asiya, hunermend, berî ku derkevîne ser şanogehê, ew bi şêweyekî rêzgirtinê destên xwe didinê. Ev jî kevneşopandineke kevna e ku, dema ku tiştekî giyanî û yekî rewşanbîrî bi hev re dibûne yek, dihate bikaranîn. Niha ew dem hatiye da ku wê têkildariya di navbera hunermend û bîneran de dîsa bidest bixin, demên borî û siberojê. Bikaranîna şanogeriya dikare bibe karekî pîroz, û leyîstikvanên şanogeriya (acter) jî dikarin bibine *avatarên* rola ku pê radibin. Şanogerî hunera pêkanîna şanoyê ber bi cîhaneke bilindtir ve hildidin. Şanogerî xwedî hêzeke gewre ye ku dikare pîrozwer be, û dikare goristanekê jî bike meydan jibo pêkanîna şanoyê.

Wergerandina ji Îngilîzî : Gurgîn Îsa (Dilovanê Deştê)

KOMA ŞANO/ QAMIŞLO